Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1191 | 31-Tîrmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Mala Dengbêjiyê stargeha parastina çanda Kobanê ye



**Ji bo parastin, zindîkirin û pêşxistina çand û hunera civaka Kobanê, Mala Dengbêjiyê hat avakirin û di nava xwe de amûr û alavên çanda Kobanê ya dewlemend jî dihewîne.**

Tişta ku mirovan ango civakan weke hebûn dide der çanda wan e, lewre mirov dikare çandê weke ruh û hebûna civakan pênase bike. Çand tiştên madî û manewî ku mirovan afirandiye û civakan ji hev cuda dike di nava xwe de bawerî, cil û berg, ziman, xwarin û vexwarin, kevneşopî, rêbazên jiyanê, huner, feraset û hwd. Di nava xwe de dihewîne. Li Rojavayê Kurdistanê ku di nava şoreşeke çandî û civakî de ye, navendên Hîlala Zêrîn, TEV-ÇAND û Desteya Çandê rol û erka parastin û pêşxistina çandên li herêmê girtine ser xwe.

Navenda Çand û Hunera Baqî Xido ya Kobanê û desteya Çandê di 3'ê Hezîranê de projeya çand û hunerî ya bi navê Mala Dengbêjiyê vekir. Ev mal piştî amadekariyên 6 mehan, bi merasîmekê deriyên xwe ji bo gel vekir. Bajarê Kobanê ku niştecihên wê Kurdên resen in, ji aliyê çand û hunera xwe ve xwedî mîrateyeke dewlemend e.

Dema mirov serdana Mala Dengbêjiyê dike, vê dewlemendiyê di amûr, şûnwar û çanda ku tê de bi rengekî eşkere berz dibe, xuya dike. Di destpêkê de avahiya malê ku ji 3 odeyan pêk tê, bi axê hatiye sazkirin. Di hundir de xaliyên hatine raxistin ên bi destên jinan hatin hûnandin in. Her wiha bi dehan parçeyên kevnar ku di devoka Kobanê de weke text û tîr, nemazlix, fanûs, papor, kevçî, tencik, kase, tas, temsî, kûp, def, tembûr, mekut, hesk, kildank, telîs, tifing û hwd. tên bilêvkirin hene. Bi wateyeke din, mirov tabloyeke ji çanda Kobanê ya resen dibîne.

**'Me tabloyek ji çanda Kobanê ya dewlemend ava kir'**

Endama Navenda Çand û Hunera Baqî Xido stranbêj Mehbûba Eto diyar kir ku Mala Dengbêjiyê derfeta nûjenkirina çanda herêmê ye û got: "Projeya çêkirina mala dengbêjiyê 6 mehan berdewam kir. Ji bo ku ev mal ji bo jinan, ciwanan û hezkiriyên hunerê bibe dergehek çandî, ev proje hat pêkanîn. Mala dengbêjiyê xwedî taybetmendiyên wisa ye ku bala her kesê dikşîne û dibe tabloyek ji çanda Kobanê ya dewlemend. Heta di avakirina malê de, me tenê axê bi kar anî ku ev yek jî xwe dispêre malên me yên kevnar ku tê zanîn dapîr û bapîrên me ev çand di malên wiha de parastin û bi pêş xistin. Em ê jî bi riya vê projeyê nehêlin ku dengbêjî û çanda me neyê jibîrkirin û her dem di bîra me de zindî bimîne."

**'Her kes berê xwe dide mala çandê'**

Mehbûba Eto bal kişand ser berhevkirinê û tiştên di Mala Dengbêjiyê de û got: "Me herî zêde di berhevkirina amûr û şûnwaran de astengî dît, ji ber tiştên kevnar in û her kes zû bi zû nade, berovajî li gel xwe diparêze û weke mîrateyeke mayînde dihêle. Lewre me beşek kirî û gelek parçe jî ji gundewaran kom kirin. Jixwe her tiştê di vê malê de ji amûrên çêkirina xwarinê, şûnwaran, xaliyan, rê û resmên malê û hwd. kevnar in û xwedî temenek dirêj in. Weke papor, hawan, teşî, tifing, text û tîr, destar, kûpên avê û hwd. Jixwe em hê jî komkirin û zêdekirina van tiştan berdewam bikin. Civaka me ji vê projeyê hez kir û rojane berê xwe dide vê derê da ku ji nêz ve bibînin û nas bikin. Lewre ez dikarim teqez bikim ku ev mal eynika naskirin û nûjenkirina çanda Kobanê ye."

**'Ked û afrîneriya jinan serwer e'**

Herî dawî Mehbûba da zanîn ku reng û naveroka malê xwe dispêre afrînerî û berhemên dayikan û wiha bi dawî kir: "Weke jin me rola xwe di avakirina vê malê de lîst û bi taybetî jî di berhevkirina pêwistiyên wê de. Lewre dema mirov dikeve mala dengbêjiyê yekser wê atmosfera çand, berhem û afrîneriya dayikan hîs dike û dibîne. Jixwe navê malê jî xwe dispêre vê yekê, tê zanîn ku dayikan bi zengilokên xwe di her bûyerê de stran ango dengbêjiyê bi pêş xistine. Di kêfxweşî, şînan û li ber dergûşên zarokan her dem cureyên dengbêjiyê nîşandan. Ji bo vê jî vekirina vê malê derfeteke mezin e ji bo nifşên nû ku ji nêz ve vê çandê nas bikin û xwedî lê derkevin. Bi taybetî jî weke jin divê di asta yekem de ew berê xwe bidin vê malê û dengbêjiya dayikê biparêzin." **NÛ JINHA**

# Bi koma ku ava kiriye jinan bi erdnîgariya Kurdistanê tîne cem hev

**Atiya Abdulrahman a ji Silêmanî bi "Koma Tûrîst a Jinên Kurdistanê" ya ku bi xwe damezrand, jinan ji malên wan derdixe û wan bi erdnîgariya Kurdistanê tîne cem hev.**

Jinên Kurd ji bo çanda Kurdî derbasî nifşê nû bikin rola sereke dileyîzin. Atiya Abdulrahman a ku mamosteyek ji Silêmaniyê ye piştî 6 salan li derveyî welat ma û vegeriya welat bi armanca danasîna çand û erdnîgariya Kurdistanê "Koma Tûrîst a Jinên Kurdistanê" ava kir.

**'Her jin dikare tevlî gera me bibe'**

Atiya Abdulrahman a 77 salî di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Ez hewl didim jinan ji malên wan derxînim û bi geran xwezaya Kurdistanê bi wan bidim naskirin." Atiya Abdulrahman wiha berdewam kir:

"Dema ez zivirîm Kurdistanê fikrek min ya avakirina komekê hebû. Ji ber vê min di sala 2010'an de heremên Kurdistanê nas kir. Ji bo bi min re biçin herêmên cuda yên Kurdistanê û derveyî welat min komek jin ava kir. Her jin dikare bibe endamê koma me û tevlî gera me bibe."

**'Ez bi cilên xwe yên gelerî gelek welatan geriyam'**

Atiya Abdulrahman diyar kir ji zaroktiya xwe ve ji cilên gelerî hez dike û wiha pê de çû: "Dema ku dayik û bavê min ji min re cilên gelerî dikiriyan min xwe gelek pîroz hîs dikir. Rûxmê ku ez bi salan li derveyî welat mam min çand û zimanê xwe parast. Ez gelek welatan geriyam û hêz û îradeya jina Kurd da nasîn. Ez li gelek welatan bi cilên Kurdî geriyam."

**'Em dixwazin di navbera jinan de têkîliyek xurt bidin avakirin'**



Yek ji endama komê Basoz Ehmed ji Zaningeha Mûsilê ya ji beşa Îngîlîzî mezûn bûye. Basoz Ehmed da zanîn ku armanca lidarxistina gerên ji bo jinan ew e ku di navbera jinan de têkiliyeke xurt were avakirin û ji bo pêşxistina çanda Kurdî tevkariyê bike û wiha got: "Em dixwazin jin di nava aşitî û yekîtiyê de jiyana xwe bidomînin û desthilatdariya mêrsalar baş nasbikin."

Yek ji endamên komê çalakvana sivîl Şoxan Mehmûd jî got: "Em weke endamekî vê komê bi saya hêz û îradeya jinan serdana xwezaya bedew a Kurdistanê dikin. Ez gelek kêfxweş im ku gelek geştên xwe bi vê komê re dikim." **NÛ JINHA**

Bi Kamîreya Zana Roj



## FERHENGA BIWÊJAN

**Serê xwe pê neêşand:**
- Guh nedayê; zehmetî neda xwe; lê nebû xwedî; girîng nedît; xemsarî kir.

**Şilî şahî ye:**
- Dema bê hemdê yekî av ji destê wî dirije, wê demê jê re tê gotin. Ango xem nake.

**Te navê here ber tavê:**
- Ku tu naxwazî ji min re ne derd e: Bi tinazî tê gotin.

**Zerera miyan tê de nîne:**
- Ti zerera wê nade te.

**LI SER DANÛSTANDINA XWEŞ Û HEVALTIYÊ**

**Barbuhêr e:**
- Bînfireh e; hevaltiya wî xweş e.

**Bi ava genî re tê vexwarin:**
- Xwînşîrîn e; hevaltiya wî xweş e.

**Bi ser bayê hev ve dibin:**
- Taybetiyên wan ji hev digirin; bi hev dikin; hevaltiya wan xweş e.

**Borê wî tenik e:**
- Danûstandina pê re hêsan e; hevaltiya wî xweş e.

**Ezê wî bixim çavê xwe:**
- Ezê pê re baş bim.

**Hevrîşim e:**
- Hevaltiya wî pir xweş e; cirxweş e.

**LI SER KESÊ BELENGAZ Û BÊBANDOR**

**Benê li dû hebanê ye:**
- Ne di destê xwe de ye; bi serê xwe nikare tiştekî bike.

**Benê li dû şûjinê ye:**
- Bi heman wateyê.

**Benê wî ne di destê wî de ye:**
- Bi heman wateyê.

**Ne av pê sar dibe, ne germ dibe:**
- Belengaz e; di destê wî de tiştek nîne; ti kes guhê xwe nadiyê; bandora wî li ser ti kesî nîne; ne qencî jê tê, ne xirabî.

**Tiştek di destê wî de nîne:**
- Bêbandor e; nikare tiştekî bike.

**Werîsê li dû heçik e:**
- Ne di destê xwe de ye; bi hineke din ve girêdayî ye; bi serê xwe nikare biryaran bide.

**LI SER WINDABÛNA KEDÊ Û SÛDNEGİRTINA JÊ**

**Bi avê de berda:**
- Keda wî ket avê; beredayî çû; kar jê nekir; sûd jê negirt.

Bi avê de çû:
- Bi heman wateyê.

**Di avê de berda:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî


## Azadiya Rêber Apo çareseriya aloziya Rojhilata Navîn e

Endamê Yekîtiya Rewşenbîrên Kantona Cizîrê Beşîr Mele Newaf diyar kir ku azadiya Rêber Apo û çareserkirina doza kurd riya çareseriya aloziya di hundirê Tirkiyê û Rojhilata Navîn de ye.**R-5**



## 'Vegera gelê Şengalê siyaseta PDK'ê û dewleta Tirk vala derxist'

Hevserokê Desteya Rêveber ya Rêveberiya Xweser a Şengalê Xwedêda Ilyas diyar kir ku gelê Şengalê gav bi gav vedigere ser ax û milkê xwe û siyaseta şerê Taybet ya ku ji aliyê PDK û dagirkeriya Tirk li dijî civaka Êzidî tê meşandin, bê encam dimîne.**R-3**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1191 | 31-Tîrmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# PDK'Ê Û DAIŞ LI DIJÎ GELÊ KURD DI HEMAN ÇEPERÊ DE NE

Dîroka Partiya Demokrata Kurdistan (PDK) bi xiyanetê dagirtî ye, ew bi tevahiya şêwazan hevkariya dijmin di şerê qirkirina gelê kurd dike. Di êrişên dawiyê yên li ser Qadên Berxwedanê de, dagirkeriya Tirk nêzî 800 çeteyên Al-Nusra û DAIŞ'ê ji bakurê Sûriyê anîne û wan li dijî Gerîlayên Azadiyê dide şerkirin. PDK'ê jî di heman çeperê de hevkariya dagirkeriya Tirk dike û xiyaneta xwe derbasî qonaxeke herî bilind kiriye.**R-6**




## Jineolojî ber bi cîhanê ve diherike




Zanista Jinê bi şoreşa Rojavayê Kurdistanê re diherike nava Rojhilata Navîn û CÎhanê. Endama Akademiya Jineolojî Zehîde Mamo wiha got "Armanc ewe ku em tecrûbeya jina Kurd bigihînin tevahî jinan, her wiha felsefeya ku jineolojî li ser wê esasê derketiye em bi jinên cîhanê re parve bikin".**R-2**


## 'Cezadayîna Silêman Ehmed, têkbirîna azadiya çapemeniyê ye'



Rêxistina Casene birîna 3 sal cezayê girtîgehê li rojnamevan û edîtorê beşa Erebî yê Ajansa Rojnews'ê Silêman Ehmed şermezar kir û weke biryareke nehiqûqî bi nav kir.**R-3**

## 'Fîlma Vejîn xwedîderketina li ked û şoreşgertiya Şehîd Vejîn e'

Ciwanên Apoyî di têkoşîna azadiya Kurdistan û şoreşa Rojavayê Kurdistanê de, li ser şopa Elî Çîçekan bi xebatên xwe destanên lehengiyê dinivisînin. Ji qadên rêxistinî, perwerde, leşkerî û siyasî bi terzê ciwantiyê berê xwe dan geşkirina qada sînameya Kurdî.**R-7**



Nehîr Pale
Her roj ji bo Kombûna Jinan a Zenûbiya şoreş e R-2


Farûk Sakik
Hewldanên tunekirina PKK'ê R-5


Kemal Necim
Projeya Dîwana Xwendinê.. R-7

# Jineolojî ber bi cîhanê ve diherike

Zanista Jinê bi şoreşa Rojavayê Kurdistanê re diherike nava Rojhilata Navîn û CÎhanê. Endama Akedemiya Jineolojî Zehîde Mamo wiha got "Armanc ewe ku em tecrûbeya jina Kurd bigihînin tevahî jinan, her wiha felsefeya ku jineolojî li ser wê esasê derketiye em bi jinên cîhanê re parve bikin".

**Vîndar Roj/ Şehba**

Jineolojî ango zanista jinê ya ku ji aliyê fîlosof û Rêberê gelên azadîxwaz Abdullaj Ocalan ve yekem car hatiye lêkolînkirin û pêşkêşkirin. Di roja me de ev zanist bi pêşengtiya jina Kurd derbasî tavahî Rojhilata Navî û cîhanê dibe. Ji bo ku em xebatê Jineolojî bêhtir di Rojhilata Navîn de nas bikin, endama Akedemiya Jineolojî di Rojhilata Navîn de Zehîde Mamo ji rojnameya me re axivî.

**-Xebatên Jinolojî di Rojhilata Navîn de kengî hatin destpêkirin û armanc jê çi bû?**

Jineolojî zanisteke ku xwebugihîna tavahî jinan û di heman demê de hemû jinên cîhanê bigire nava xwe ye. Bi derketina vê zanistê re bê guman xebatên sereke yên naskirinê û belavkirinê ji şoreşa Rojavayê Kurdistanê de hate destpêkirin. Xebatê jineolojî di giştî Rojavayê Kurdistanê de ne nû ye, lê di giştî Rojhilata Navîn de weke zanist û xebatekî nû û weke wê nehatiye pêşkêşkirin tê dîtin; li ser wê esasê nû hatiye destpêkirin. Ji ber jineolojî zanista tavahî jina ye me jî xwest em vê zainstê di asta Rojhilata Navîn de bidin meşandin û xurtkirin.

Xebatê jineolojî bêhtir li ser avakirina têkiliyan bi rêxistin, komele, însiyatîfên ku jin xwe tê de birêxistin dikin tê meşandin. ev xebat bi mijûlkirina bi van komele û îsiyatîfan re tê kirin. Hîz zêdetir li ser xurtkirina têkiliya û avakirina hevgirtinekê xebatê jineolojî tê domandin.

Armanca yekemîn em dixwazin tecrûbeya jina Kurd bigihînin tevahî jinan û astên berfirehtir, jinên ku xebatê ji bo jinan didin meşandin zêdetir jina Kurd û zanista jineolojî nas bikin. her wiha felsefeya ku jineolojî li ser wê esasê derketiye em bi jinên din re parvebikin. Ya din jî tecrûbeya şoreşa jin weke sembûla yekemîn ji şoreşa jinê re di şoreşa Rojavayê Kurdistanê de hatiye destpêkirin



gelek girînge ku em vê yekê ji cîhanê re bidin naskirin.

**-We çi xebat dan meşandin û xebatên wê heta çi astê de hat qebûlkirin?**

Belê, ji bilî xebatên sanasîn û veguhestina zanista jineolojî ji jinên ku em bi wan re di nava têkiliyan de ne. ji komele û insiyatîvan zêdetir têkiriyên me bi jinên çalakvan yên serbixwe her wiha bi nivîskaran, helbestvanan û jinên ku cihê xwe di qadên siyasî de digrin re jî hene. Hewildanên me zêdetir ku em danûstandinê bi wan re bikin. di wateyekî de em dixwazin bi hemû jinên ku xwedî rol û bandorin di civakê de bidin avakirin, da ku guhartin û veguhartinên cidî him di kesayet û him jî di cavakê de avabikin. Ji ber dema em behsa jineolojî bi van jin û civakan re dikin, dibînin ku ev xebatekî nû ye li ser wê esasê jî balkişandinek û qebûlkirinek hatiye avakirin.

Di giştî de lehengiya jina Kurd çawa ku li hember terora DAÎŞ ê sekiniye û bi bin xistiye bihîstine, lê di aliyê rêxistinbûyîna ku jina Kurd da ye avakirin, her wiha avakirina sîstema hevserokatiyê û cihgirtina wê tê de, tiştekî xerîbe ji bo wan û bala wan kişandiye. Di vê warî de hewildanên ku em çawa vê yekê bidin naskirin tê kirin. zêdetir welatên ku me berê xwe daneyê di Rojhilata Navîn de Misir, Libnan û Tunês e. bê guman pilansazî û bernameyên ku em derbasî welatên din bibin jî hene.

**-Zihniyeta zilam, li rojhilata navîn ji ber gelek sedeman, xwe di hemo beşên civakê de kur kiriye, çiqas girînge ku ev zihniyet bê guhartin û xebatên we yên ji bo vê yekê ?**




Xebatê me tenê di çarçoveya jin de nayê gerandin. Jineolojî ji destpêka derketina wê de zanisteke jiyanî ye ku bi her du cinsan re têkildar e û diherike. Gelek girînge ku civak, mêr û ciwan bikevin nav de û nasbikin. Di Rojhilata Navîn de qeyranên ku rûbirû pê re dimîne hene û civak êşa van qeyranan dikşîne. Aloziyên ku derdikevin di asta yekemîn de bi zihniyeta zilamtiyê ya ku di mejiyê civakê de hatiye çandine çi jin û çi mêr dibe hatine derketin. ji lewra gelek girînge ku em di vê warî de xebatê jineolojî bimeşînin. Ger guhartin û veguhartin çênebin wê pirisgirêkên civakê jî neyên çareserkirin.

Di asta yekemîn de xebatê me bi jinê tê destpêkirin, lê ji bo ku em di civakê de herikandinekê avabikin gelek piroje û nîqaşên me bi mêrên ku cihê xwe di xebatên cur be cur de digrin de re çêdibin. Pirs û nîqaşên wan çêdibin û ev zanist balkêşiyek di wan de avakiriye, lê ji ber ferizkirin û rûbirûbûna bi zihniyeteke ku xwe di hemû şaneyên civakê de daye avakirin, him xetimandinek heye him jî zehmetiya vê yekê dikşînin. Ji lewra hewildanên me yên bi îsrar hene ku em bibin alîkar û derbas bikin.

Bê gumand di çarçoveya pêşxistina zanista jineolojî di hemû civakan de gelek xebatên berfireh yên perwerdê û naskirinê hene. Hin ji xebatan çawaniya avakirina têkiliyên dan û standinê, yê din avakirina semîner ango celset bi zimanê Erebî bi komeleyên di welatên ku xebatê me tê de tê meşandin re tên çêkirin sîstemên wan di asta komxebat, civîn û panêlan de tê birêvebirin. bê guman di nava van xebatan de jin, mêr û ciwan cihê xwe tê de digirin û dan û standinên me tên kirin. Ya din xebatên me bêhtir li ser Medya Civakî tê meşandin, her wiha bi riya zoom xebatên atoloya jî tên meşandin.

**-Jinolojî ji bo jin û civakê xwedî girîngiyek çawa ye? Çima ewqas jin ji her derê û her zimanekî li derdorê kom bûne û pê bawerkirine?**

Xebatê jineolojî him di Rojhilata Navîn de û him di Ewropayê de êdî tê meşandin û naskirin, ji ber vê yekê jî erka me ye ku em xwe bigihînin tavahî cîhanê, ne tenê em di asta Bakur û Rojhiltê Sûriyê û Kurdistanê de bimînin. gelek girînge ku em di xurtkirina balavkirina vê zanistê de em xebatên xwe bidin meşandin. bi taybet divê zanista ku ji aliyê Rêber APO ve hatiye derketin ji bo çi û çi armanc dike bê naskirin. Bi riya vê xebatê tê dîtin ku ev zanist bandorekê di nava jinan de dide avakirin. Xwesteke wan ya dîtina projeya demokrasiyê û xwendina vê zanistê derdikeve pêş.

Di Rojhilata Navîn de gavên me yên yekemîn hatine avêtin û di berfirehkirina wê de gav tên avêtin. Yê din armanca me li ser asta cîhanê ku emê çawa vê xebatê bidin meşandin e, ji lewra pilannameyên me him yên dem kurt hene û yên stratejîk dem dirêj jî hene.

## Ji Pênûsa Jin

### Her roj ji bo Kombûna Jinan a Zenûbiya şoreş e

Nehîr Pale

Piştî rizgarkirina Kantona Minbic, Tebqa, Reqa û Dêra Zor jin ji hemû pêkhateyan li hevdû kom dibin.

Ji pêkhateya Çerkes, Ereb, Kurd û Tirkmen ciyê xwe di rêveberî û komîteyên Meclisa Kombûna Jinan a Zenûbiya de digrin. Komîte li gorî pêdiviyên jin hatine ava kirin û bi riya wan jin têne birêxistin kirin. Ev komîte di aliyê fikrî û pîşeyî de têne perwerde kirin. Perwerde ne tenê bi riya dewreyan tê meşandin, gelek cureyên çalakiyan ji bo jin perwerde ye. Dema ku buyer diqewimin jin li her çar Kantonan bi riya daxuyaniyan û çalakiyên curbecur helwestê xwe diyar dikin. Buyer şîrove kirin û nirxandin, li beramberî buyeran buyîna xwedî helwest rêbazên perwerde û têkoşînê yên hebûna jinê diyar dikin.

Mala Jin li her çar Kantonan heye, hejmarekî ne kêm jin ji bo bighîjin mafên xwe, hesab ji mêr were xwestin û pirsgirêkên wan ên malbatî werin çareser kirin, berê xwe didin Mala Jin. Gelek keç hene ku malbatên wan dixwazin bi darê zorê wan bizewcînin an jî tûndî li wan têkirin, berê xwe didin Mala Jin da ku bighîjin çareseriyê. Meclisa Kombûna Jinan a Zenûbiya bi riya Komîteyên xwe li hemberî zîhniyet û hemû rêbazên zayendperestiyê têdikoşe.

Diyardeya tûndiya li ser jin îdeolojîk e û niha jin berpirsyartiyeke gelekî giran rakirine. Jin di bin banê Meclisa Kombûna Jinan a Zenûbiya li hevdû kom dibin rewşa siyasî şîrove dikin, rapora xebatên xwe pêşkêş dikin, rewşa xwe ya rêxistinî dinirxînin û pîlansaziyên xwe datînin. Li Herêma Bakur-Rojhilatê Sûriyê her roj ji bo jin şoreş e.

25`ê Tîrmehê Meclisa Kombûna Jinan a Zenûbiya civîna xwe ya salane bi tevlîbûna jin ji Kantona Minbic, Tebqa, Reqa û Dêra Zorê lidarxistin. Tevî mêvanan 250 jin beşdarî civînê bûn. Rengê cilûbergên jinan ên hemû pêkhateyan xemla civînê bû. Di civîna salane de rewşa siyasî şîrove kirin, rapora xwe ya xebatê pêşkêş kirin, rewşa xwe ya rêxistinî nirxandin û pîlansaziya xwe derxistin.

Di nirxandina rewşa rêxistinî de hemû rêveberiyên jin rexne dayîna xwe dan. Rexnedayîn li beramberî hemû jinên tûndî li wan hatiye kirin, jinên ku dawî li jiyana xwe anîne û jinên bûne qurbanên polîtîkayên qirker û nehatine parastin, hat dayîn. Kêm û kurtiyên xwe yên di rêxistinkirin û perwerdekirina jinan de anîn ziman û nirxandin. Di heman demê de girîngiyeke mezin ji bo parastinê hat dayîn. Pêdivî hat dayîn ji bo tevayî jin li bajar û gundewaran werin rêxistin kirin. Her wiha jin li saziyên xweser û giştî hevdû temam bikin. Di saziya malbatê de jî ji bo guhertina mêr têkoşîn were kirin.

Ji bo gihîştina rêbazên têkoşînê û parastinê yên xurt gelek jinan pêşniyar kirin ku dewreyên perwerde yên fikrî û pîşeyî werin vekirin da ku jin bikarbin xwe biparêz in.

Di encama civîna salana ya Meclisa Kombûna Jinan a Zenûbiya de biryarên girîng hatin girtin. Yek ji wan biryaran ew bû ku meha Tebaxê Konferans li ser parêznameya Rêber APO (Sosyolojiya Azadiyê) were birêxistin kirin. Her wiha Kovarek bi navê Zenûbiya were derxistin, ji bo jinên êlan jî civîn were çêkirin.



# 'Fîlma Vejîn xwedîderketina li ked û şoreşgertiya Şehîd Vejîn e'

Ciwanên Apoyî di têkoşîna azadiya Kurdistan û şoreşa Rojavayê Kurdistanê de, li ser şopa Elî Çiçekan bi xebatên xwe destanên lehengiyê dinivisînin. Ji qadên rêxistinî, perwerde, leşkerî û siyasî bi terzê ciwantiyê berê xwe dan geşkirina qada sînameya Kurdî. Fîlam Vejîn jî hêz û îradeya ciwanên Kurd yên serdemê îfade dike.

**Zana Roj/ Şehba**

Beriya 9 mehan Tevgera Ciwanên Şoreşger yên Sûriyê xebatê kişandina Fîlma Vejîn destpêkirin. Di nava ciwanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de ev yekemîn berheme ku bi vê rengî tê derxistin. Ciwan û jinên ciwan di nava vê xebatê de erk û misyona li ser milê ciwanên serdemê dan îfadekirin. Fîlma Vejîn ji aliyê endam û xebatkarên ciwanan ve hatiye kişandin, bi derfetên herî kêm fîlma Vejîn bi perfesonaltî hate derketin û cihê xwe di nava dilê temaşevanan de avakir.

Têkildarî Fîlma Vejîn ya ku ji aliyê Tevgera Ciwanên Şoreşger yên Sûriyê ve hatiye kişandin endamê Tevgera Ciwanan ya Kantona Efrîn û Şehbayê Fiuad Mihemed ku di fîlm de lîstikvanê sereke ye ji rojnameya me re axivî.

**Berhemeke şoreşgerî raberî gelê xwe kirin**

Fûwad destnîşan kir ku Fîlma Vejîn bi derfetên herî kêm hate amedekirin û wiha got: "Fîlma Vejîn yekemîn berheme ku ji aliyê Tevgera Ciwanan vet ê amedekirine. Ev Fîlm li Bajarê Reqayê bi tevlîbûna nêzî 15 ciwan û jinên ciwan hate amedekirin. Fîlm bi defetên herî kêm yên di destê me de hate amedekirin, tenê bi 2 kemîreyan û 1 dironê hate kişandin. Bi rastî di kişandina vê berhemê de tu destek yan alîkarî ji aliyên din yên têkildar ve nehatin xwestin. Ciwanên Şoreşger bi hebûn û terzê xwe xwestin berhemekî şoreşgerî ku tê de cenga Azadiyê îfade dike pêşkêşî gelê xwe bikin."

**`Gavên valaderxistina siyasetên dijmin divên`**

Fûwad di derbarê armanca fîlm dewiha got: "Armanca me ya sereke ku ev fîlm di nava tavahî ciwanên cîhanê û yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de bê temaşekirin. Bi rastî îro dema ku em li ciwanên heyî dinêrin di nava penca qirkirina çandî, hebûn û îradeyê re derbas dibin, leystikên dijmin yên herî zêde li ser ciwanan tên bikaranîn. bi xet û siyasetên gelek zirav nirxên ciwantiyê digrin hedef. Bi taybet di şoreşê de em di ferqa leyîstok û şerê taybet ya ku dijmin dixwaze me pê bide bandorkirin de ne. ji lewera gavên ku em ji dijmin re îsbat bikin ku em ciwanên li ser hîmên şoreşgertiyê mezin bûne û wê negihîne armancên xwe. Ciwanên serdema îro gavên




gelek mezin jê tên xwestin her wiha têkoşîna hişmendî, îdeolojîk, leşkerî û guhartin û veguhartinê jê tê xwestin. Yek ji armancên Tevgera Ciwanan jî ku ciwanên heyî nekşin xeta dijmin û careke din li xwe û hebûna xwe vegerin."

Fûwad wiha li axaftina xwe zêde kir: "Ev fîlm di destpêkê de navê wê `Werin Cenga Azdiyê` bû, lê piştî Şehadeta Heval Vejîn navê Fîlmê hate guhartin. Sedema guhartinê jî ji ber fikir û xebatê ku ji bo fîlmê hatiye orgenîzekirin ji aliyê Şehîd Vejîn Jiyan bû. ji lewra ji bo bîranîna şehadet û keda wê, her wiha li ser xeta têkoşîna şehîd Vejîn meşandin navê Fîlmê bû `Vejîn`."


**`Em ê bibin hêz û eniya yekemîn ya têkbirina dagirkeriyê`**

Fûwad di dawiya axaftina xwe de banga hemû ciwanên Kurd û yên şoreşger kir û wiha got: "Em banga tavahî ciwanên Kurdistanê dikin ku em xwedî li şoreş û hebûna xwe derkevin. Xwedîderketina li mîrasê bi hezaran ji şehîdan her wiha xwedîderketina li serhildanên Kurdistanê encax bi ciwanan pêk bê. Em bangawaziya rihê ciwantiya welatparêz dikin ku derkevin meydanê û bibin hêz û enya yekemîn ya têkbirina pilan û siyasetên dagirkeriyê."

# Çanda Kevnar a Êzdiyatî xwe bi zarokan nû dike

**Dewreya perwerdeya muzîkê ku beriya du mehan ji aliyê Navenda Çand û Huner a Stiya Nexşa ve ji bo zarokan hatibû destpêkirin, didome. Armanca dewreyê zindîkirina çanda kevnar a Êzidî ye.**

Navenda Çand û Hunerê ya Stiya Nexşa ya Şengalê ji bo zindîkirin û tunenebûna çanda Êzidî, beriya du mehan dewreyeke perwerdeyê ya zarokan dabû destpêkirin. Dewreya ku beriya du mehan hatibû destpêkirin, bi 30 zarokan bi rengekî serkeftî berdewam dike. Ji perwerdeyê armanc ew e ku zarok hem fêrî amûrên muzikê bibin û hem jî fêrî çanda xwe bibin da ku çand Êzidî neyê tunekirin û derbasî nifşên nû bibe. Ji aliyê din ve bi taybetî 10'emîn salvegera Fermana 74'an destpêkirina dewreyeke bi vî rengî, parastina çand û baweriya êzdiyatî, li dijî fermanan bersiv e.



Têkildarî dewreya perwerdeyê ya muzîkê mamosteyên ku perwerde didin zarokan axivîn û diyar kirin ku ew dixwazin hîn bêtir çanda Êzidî bidin xuyakirin.

**'Em tenê perwerdeyê muzîkê nadin'**

Mamoste Bêrîvan Şengalî da zanîn ku 30 şagirtên wan hene û ew zarokan fêrî amûrê muzîkê dikin û wiha got: "Em dixwazin dewreyên bi vî rengî çanda xwe hîn bêhtir bidin xuyakirin. Ji bo çanda me winda nebe em zarokan fêrî çanda Êzidî dikin. Heta em tenê fêrî muzîkê nakin, em perwerdeya çand û exlaq jî. Em dixwazin ev zarok fêrî hevaltiyên rast jî bizanibin û bikaribin tiştên baş û xirab ji hev derxînin."

**Wek şagirt destpê kir lê niha mamoste ye**

Mamoste Sosin Seydo jî hîn zarok bûye çûye Navenda Çand û Huner a Stiya Nexşa, li wir fêrî amûrên muzîkê bûye û niha wek mamosteyê muzîkê li Stiya Nexşa zarokan fêrî amûrên muzîkê dike. Mamoste Sosin der barê dewreya perwerdeyê de destnîşan kir ku ew di perwerdeyê de her tiştî fêrî zarokan dikin û ev nirxandin kir: "Ev 3 meh in me perwerdeya zarokan daye destpêkirin. Perwerde heftê 3 roj in û zarok roja în, şemî û yekşemê tên perwerdeyê. Di van her 3 rojan de em amûrên muzîkê, çand êzidî fêrî wan dikin. Em dixwazin çanda kevnar a Êzidî bi zarokan re geş bibe û neyê tunekirin. Ji aliyê din ve em her aliyan ve zarokan perwerde dikin. Em tenê perwerdeya muzîkê nadin, em perwerdeya tenduristiyê jî didin, perwerdeya exlaqê jî didin."

**Banga zarokan**

Her wiha zarokên ku ev du meh in perwerdeya muzikê dibînin jî kêfxweşiyên xwe anîn ziman û diyar kirin ku ev di du mehan de fêrî gelek tiştan bûne û bang li hemû zarokan kirin ku tev li perwerdeya muzîkê bibin da ku çanda xwe bidin jiyandin. **JÎNHA**

## Têbînî



### Projeya Dîwana Xwendinê..

Kemal Necim

Di nivîseke berê de me behsa komên xwendin û nixandina pirtûkan kiribû û çawa çalakiyên wiha rê li pêşiya pir encamên erênî vedikin, yek jê dê pirtûk û berhemên nivîskaran di nav beşeke xwêneran de bêne belav kirin û kirîn, her wiha dê der barê naveroka berheman de jî nêrînên cuda derkevin ku yê nivîskar jî dikare sûdê ji wan nêrînan bigire. Ji bilî wilo jî pir sûd û mifaya van rûniştinan hene.

Yek ji wan projeyên lidarxistina rûniştinên xwendin û nirxandina pirtûkan ku li asta herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê têne lidarxistin, projeya (Dîwana Xwendinê) ye ku ji hêla Dîwana Wêjeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve tê lidarxistin e.

Ta niha li herêmê çend ezmûn û çalakiyên komên xwendin û nirxandina pirtûkan hatine lidarxistin, carna ji hêla hin komên rewşenbîran ve, carna jî hin saziyên rewşenbîrî, lê piraniya wan çalakiyan nebûn çalakiyên berdewam û demdirêj, her wiha di çarçoveya bajarekî de man û berferh nebûn.

Projeya Dîwana Xwendinê dikar bê gotin ku çalakiya herî demdirêj a xwendina û nirxandina pirtûkan e, ku ev nêzî du salan e bê navber berdewam dike. Çalakiya destpêkê di 8`ê cotmeha sala 2022`an dest pêkir û heta roja me ya îro jî berdewam dike.

Yek ji taybetmendiya projeya Dîwana xwendinê ew e ku guh dide berhemê xwecihî, ango hemû berhemên ku têne xwendin çi bi zimanê Kurdî û çi bi zimanê Erebî yên nivîskarên xwecihî ne û ji weşanên weşanxaneyên herêmê ne, lewma di piraniya rûniştinan de derfet çêdibe ku nivîskarê berhemê bi xwe beşdar bibe, nirxandinan guhdar bike û bersiva pirsên beşdaran bide û yên beşdar û yê nivîskar hevdû ji nêz ve nas bikin.

Her wiha çalakiyên Dîwana Xwendinê li gelek bajar û bajarokan têne lidarxisin. Her mehê sê çalakî têne lidarxistin, yek li kantona Kobaniyê du jî li kantona Cizîrê, heta niha li kantona Cizîrê çalakiyên rûniştinê li bajarên Qamişlo, Hesekê, Dirbêsiyê, Amûdê û Dêrikê hatine lidarxistin, lewma çalakî tenê di çarçoveya herêmekê yan bajarkî yan komeke diyar yan kesan de nema ye û gelek xwêner û rewşenbîr ji deverên cuda beşdarî çalakiyan bûne.

Bi saya van rûniştinan heta niha 40 pirtûk hatine xwendin û nirxandin, ango 40 pirtûk her carê nêzî 15 nisxeyan hatin kirîn û belavkirin. Ev jî derfeta peydakirin û belavkirin û xwendina pirtûkan ferehtir kiriye, ji xwe ev yek ji armanc û sûdên rûniştinên xwendina pirtûkan e.

Pirojeya Dîwana Xwendinê di pêvajoya du salan de derfeteke pir mezin û fereh li pêşiya pêşxistina qada rexneya wêjeyî li herêmê vekir. Ji bo derdor û kesayetên ku bi rexneya wêjeyî ve mijûl dibin derfeteke baş peyda bûye ku bibin piştgir û hewil bibin vê çalakiyê baştir bikin.

Lê mixabin li gorî çavdêrî û dîtin û şopandinê, heta niha ev derdor bi taybet baş xwedî li vê çalakiyê derneketin. Her çiqas ev derdor di dîdar, civîn û hevdîtinan de dikin pitpit ku çalakiyên rexneyî kêm û qels in, lê çalakiyeke mîna Dîwana xwendinê nabînin û beşdar nabin û piştgiriya wê nakin.

# ‘PDK û Mala Barzanî di xiyaneta xwe de bi israr in’

Dîroka Partiya Demokrat a Kurdistan (PDK) bi xiyanetê dagirtiye, ew bi tevahiya şewazan hevkariya dewleta Tirk a dagirker di şerê qirkirina gelê kurd de, dike.

**Amara Baran/Qamişlo**

PDK’ê xiyaneta xwe ya li dijî Kurdan didomîne û wekî ji rêzê dibîne. Ji nîvê Nîsana par ve bi artêşa Tirk a dagirker re beşdarî êrişên wê yên domdar dibe. Piştî belavbûna hin dîmenên ku avakirina baregehên leşkerî li herêmê ji aliyê artêşa Tirk ve di bin ala PDK’ê de nîşan didin, ev xiyanet bi awayekî zelaltir eşkere bû.

Tekîldarê êrişên dagirkeriya Tirk li ser Başurê Kurdistanê û xiyaneta PDK’ê, parlamentera Partiya DEM Salîha Aydenîz ji rojnameya me re axivî.

**‘Xiyaneta mala Barzanî ji dîrokê û heta niha berdewame ’**

Saliha Aydenîz diyarkir ku êrîşê dewleta tirk li ser Başurê KurdIstanê tenê bi demên dawiyê re mirov nikare binirxîne û wiha got: “Politikaya dewleta tirk hertim polîtîkaya qirkirin û tunekirinê ye. Rexistina komara Tirkiyê li ser tirk -sunî îslam xwe pênase dike û heta roja me ya îro aniye. Di serî de erîşên dewleta tirk li ser politikaya avakirina komara tirkiye yê sedsal beriya niha dema ku Rojhilata Navîn hate xêzkirin sîstema netew dewlet a dewleta tirk avabû.

**‘Dewleta tirk ziman, çand û baweriyên gelên Kurdistanê qebûl nake’**

Salîhe wiha domand: “Dewleta tirk di Rojhilata Navîn de hemû peymanên navnetewî binpê dike. Dewletên ku Kurdistan kirin çar parçe ango,Suriyê, Îran, Iraq û tirkiyê jî di nav de ji bo ku ji destkeftiyên kurdan xilasbibin her cûre erîşan pêk tînin û dixwazin xwe bi wê pênase bikin, pewîstî heye ku di sedsala 21.mîn de Rojhilata Navîn ji nû ve were xêzkirin , di vê xêzkirinê de bi qasî dewletên hegemonîk, dewletên heremê jî dixwazin axa xwe fireh bibin. Dewleta tirk dixwaze xeyalên xwe yên osmaniya nû pêk bînîn, di heman deme de projeya xwe ya mîsaqê- mîlî jî bidest bixin. Hevalbendên AKP’ê û MHP’e dixwazin Hewlêr û Kerkûkê wekî salên 1980, 81û 82’an polîtîkayên xwe yê ji bo pêkanîna mîsaqî mîlî di wan hereman de pêk bînin.”

**‘Dewleta tirk dixwaze xeyalên xwe yên Mîsaqî-Mîllî pêk bîne’**

Salîhe anî ziman ku: Dewleta tirk ji 21 Nîsanê heta niha bi awayeke fermî stratejiya Kapîtalîst Modernîte ye pêk tîne, û wiha got” Amerîka ji bo tasfiyekirina kurdan, rola tunekirina kurda daye dewleta tirk, tabî dewleta tirk jî rola xwe ya dijminatiya Rojhilata Navîn dileyize û rojane dijminatiya xwe ya sedsalî a li hemberî gele kurd pênase dike, ê tabî li ser van giştî dixwaze xeyalên xwe yê Mîsaqî-Mîllî tamam bike ji bo na vê bi awayeke fermî erîş dike. Di şerê li Suriyê de jî û pişte ku di 9 Cotmeha 2019’ an de peymana Şengalê hat destgirtin, li wir hat xuyakirin ku destkeftiyên kurdan hene, ji ber ku di Rojhilata navînde gelê kurd xwedî erkekî ne ku siyaset û civake kî ku politika xwe diyarbikin e. Ne mimkune bê gele kurd rojhilata navîn ji nûva bê xêzkirin. Dewletên hegemonîk yên wekê Emerîka û Awropa hem jî dewletên heremê bi erkbuyîna gele kurd tê xwestin ku were binpêkirin, dewleta tirk bi awayekî fermî peymanê navnetewî û mirovî binpê dike û erîşê Başûr dike. Dewleta tirk li Başûrê Kurdistanê gundan vala dike û bi çekên kimyewî bombebaran dike, xwezaya heremê qetil dike, dewletên hegemonîk û hemû dewletên heremî li hember van erîşan bêdeng dimînin ew jî tê wateya ku bi dewleta tirk re di nav hevkariye kê dane.”

**‘İraq di nav alozîyekî pir mezin de dijî ‘**

Salîhe bal kişand li ser aloziya ku dewleta Iraqê dijî û wiha got: “Dewleta Iraqê roja me ya îro de aloziyeke pir mezin de dijî, iraq xwe bi xwe rê va nabe, ew ji aliyê dewletên derva yên hegemonîk û yên cîran ve tê birêvebirin. Her çiqas li herema Başûr rêvebereke hebe jî ev rêveber teslîmî dewleta tirk bûye, ew ji aliyê dewleta tirk û çeteyên wî ve tê rêvebirin, ji ber ku erkekî wan li ser Iraq û herema Başûr nemaye ji bona wê bêdengin. Sîstema faşîzmê a yek îktîdar û yek ziman yek ol û yek bawerî ji bo wan jî derbastare. Hikumeta Başûr ji bona ku iraqê îkna bike di nav tevgerê de ye.”

**‘PDK’e li ser gelê heremê zilim dide meşandin ’**

Salîhe wiha li axaftina xwe zêdde kir: “Di xeyalê AKP û MHP’ê de û di stratejiya wan de statuya kurdan ziman û çanda kurdan teqez tuneye lê belê reveberiya başurê Kurdistanê naxwaze vî fambike. Îro dewleta tirk bi îktîdara AKP û MHP ‘ê çawa kiriz û qausa siyasî aborî û civakî jiyan dike di heman deme de reveberiya Başurê Kurdistanê jî eynî kiriz û qausa jiyan dike. Reveberiya herema başur li heremê zilim û zordariyê dide meşandin.”

**‘Destkeftiyên gelê Başûr radestî dewleta tirk hatiye kirin’**

Salihe da xuyakirin ku PDK’ê destkeftiyêN gele Başûrê Kurdistanê pêşkeşê dewleta tirk dike, poîtikaya ku îro PDK’ e dimeşîne ne politikaya parastina destkeftiyên kurda ye û wiha berdewam kir: “Tekiliya mala Barzanî bi dewleta tirk re li ser esasê bazirganiyê ye, ev jî dihêle ku pêşeroja başurê Kurdistanê di bin xeteriyê de bimine û heman deme de sekna PDK’ê û mala Barzanî Rojavayê Kurdistanê jî di bin xeteriyê de dihêlin ji ber ku li her çar parçêyen da erîşê destkeftî û statuya kurdan dike. Çawa Efrîn, Serê Kaniyê û Giri Sipî hat dagirkirin di destê çeteyan de hiştîn îro eynî tişt li Başûrê KurdIstanê jî valakirina gundan şewtandina daristana û mecburkirina koçberiya gel dikin herwiha 600 çeteyên DAÎŞ’ê di wan gundin ku hatine valakirin de hatine bicîhkirin ev jî Efrîn Serê Kaniyê û Girêsipî tîne bira mirov. Statuya başur jî bi qansê statuya rojava di xeteriyê da ye. “



**‘Xeteriya li ser başurê Kurdistanê te wateya xeteriya li ser giştî parçeyan ’**


Salîha di dawiyê de bang li gelê gelê kurd kir ku xwedî li axa başur û tevgera azadiyê derbikevin û wiha got: “Gelê kurd bi hezaran salin tekoşîneke bê hempa dide meşandin li çar parçeyên Kurdistanê bi milyonan berdel hatine dayîn bakur jî başur jî û hemû parçeyên din girêdayê hevdûna ger parêçeyek di xeteriyê da be tê wateya ku parçeyên din jî di bin xeteriyêda ye, ger yekîtî û îttîfaqa gele kurd tunebe ewe destkeftiyên kurdan li her çar parçeyên Kurdistanê di bin xeteriyê da be. Ger li hemberê yekîtî û tifaqa kurdan xeterî hebe û di nav tekîliyên qirêj da be lazime ewê kurdîstanî bifikire van meseleyan pir net pir vekirî bibêje kî PDK ango malbata Barzanî hûn li ser destkeftî û tasfiyekirina kurdan sekinîne. Îro destkeftiyên kurdan dîtin û xwedî derketin berpirsiyariyekî dîrokî dide pêşiya me ger em yekîtiya xwe xwedî dernekivin dîrok hesab ji me bixwaze ji bo wî jî pêwîstî bi yekbûyîna gelan heye.”

# Şaredarî ji bo xizmeta civakê kar û xebatê xwe dewam dike

**Avêsta Menaf/ Qamişlo**

Cigera Hevseroka Şaredariyan a Kantona Cizîrê Bêrîvan Omer diyar kir ku ew dixwazin bi her kesî re bibin alîkar û xebatên Şaredariyê wekî xebatekî sereke lê binêrin, ji ber ku şaredarî saziyeke sereke ya pêdiviyên civakê ye.

Li Rojavayê Kurdistanê piştî ku di 19’ê Tîrmehê de gel rêveberiyên bajaran bidest xistin û dest bi avakirina sîstema xweseriya demokratîk kir, xebatên şaredartiya gel ku yek ji lingên esasî yên vê sîstemê ne jî, roj bi roj berfirehtir bûn. Şaredariyên gel ji bo rêvebirin û pêşkêşkirina xizmetguzariyên cîhêreng ji bo civakê, xebatan rojane yên girîng dan meşandin. Di vê çarçoveyê de Cigera Hevseroka Şaredariyan a Kantona Cizîrê Bêrîvan Omer ji Rojnameya me re axivî.



**Kar û xebat**

Bêrîvan Omer balkişand ser kar û xebatên şaredariyê yê sala 2024`an û wiha got: “Ev demeke me hewl da ku xebatê şaredariyan bi awayek lezgîn çareser bikin. Ji xwe hemû pirojeyên ku têne avakirin helbet bi nerîn û fikirê gel têne avakirin, yek ji wan pirojeyan jî pirojeya avakirina beşan di hundirê şaredariyan de bû. Di heman demê de her şaredariyek ji ya din feriq dike, yanî dikare bê gotin ku di her şaredariyekî de pilan û pirojeyên xwe yên taybet heye. Yek ji çareseriya pirsgirîkên herêmê Şaredariye. Hem di anîna avê de be û hem jî di avakirina riyan de be. Di heman wextî de em gelek caran di warê derfetan de wendahî jiyan dikin, ji ber ku ew derfetên me yên zêde tune ye de ku em bi erkên xwe bi awayekî tam rabin. Her çiqas pirsgirêk mîzanî be jî, lê ji bo herêmê wê gelek kêm çareser bibe.”

**‘Pêwîst e xebateke hevbeş were kirin’**

Bêrîvan di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Di vê salê de em rastî êrîşek gelek mezin hatin, ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve, tê zanîn ku dewleta Tirk bi êrişên xwe eraziyek mezin li Bakur û Rojhilatê suryê girt û ziyanên madî di astek mezin da hate dayîn. Ji lewra em di serî de dixwazin ev cihên ku hatine xirab kirin, ji nû ve ava bikin, ji ber ku pirsgirîka debarê gelek mezin e. Ji bona vê yekî em xwedî îda ne ku di vê salê de emê hemû pirsgirîkan çareser bikin û careke din emê hewl bidin detfetan ji bo civaka xwe avabikin. Dikarim bibêjim ku di vê salê de jî pirsgrîka avê di Qamişlo de çêbû dîse ne sedem gel bû, sedema sereke em bûn, pêwîst bû me li gorî gel xwe amede kirbane lê di vî alî de hindek kêmanî keta karê me de. Di van rojên bûrî de me gelek cih avakirin ji bo meseleyên xizmetguzariyê da ku civaka me ji halê heyî xilas bike. Me di astek mezin de pirsgrîka avê di herêmê de çareser kirye. Ji bo ev babetê were bihurandin pêwîst e xebatek hevbeş were kirin.”

**‘Xebatên Şaredariyan li gorî pêdiviyên Rojane baş dimeşe’**

Bêrîvan bal kişand ser meseleya mêzaniyê û wiha got: “Pirsgirêke ku li pêşiya me dibe asteng, mêzaniy e ku gelek kême tê dayin. Her weha dema ku em mêzaniyê kom dikin jî rewşa êrişên dewleta Tirk dikeve meriyetê de, ji lewra ew pirojeyên ku me dabûn avakirin xirab dibin. Bi rastî em bi pilan nêzî pêdiviyên civaka xwe dibin, lê êrişên dewleta Tirk a dagirker yên li ser saziyên me di astekî de em dane seknandin. Yanî dikarim diyar bikim ku êrişên dewleta Tirk bû sedem ku em careke din istratîjiya xwe biguherin, Dîse jî xebatên Şaredariyan li gorî pêdiviyên Rojane baş dimeşe, çi di hêla paqijkirina riyan de be çi jî di aliyê anîna pêdiviyan.

**‘Şaredarî saziyeke sereke ya pêdiviyên civakê ye’**

Bêrîvan Omer di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Gelek Bajarên piçûk wekî Amûdê û Dirbêsiyê hin pêdivî hatine parvekirin hem di aliyê çêkirina riyan de be hem jî di anîna avê de be. Di dawî de jî em dixwazin bi her kesî re bibe arîkar û xebatên Şaredariyê wekî xebatekî sereke lê binêrin, ji ber ku şaredarî saziyeke sereke ya pêdiviyên civakê ye.”



# ‘Cezadayîna Silêman Ehmed, têkbirîna azadiya çapemeniyê ye’

Rêxistina Casene birîna 3 sal cezayê girtîgehê li rojnamevan û edîtorê beşa Erebî yê ajansa Rojnews´ê Silêman Ehmed şermezar kir û weke biryareke nehiqûqî bi nav kir.

**Navenda Nûçeyan**

Rêxistina Casene, Navenda Metro û Federasyona RONÛS’ê ragihand divê rojnamevan Silêman Ehmed bi yasaya rojnamevaniyê hatiba dadgehkirin, her wiha ji destpêkê ve nehiştin parêzer û malbata wî pê re hevdîtinê bikin, lewra ev jî binpêkirina mafên mirovan e. Rêxistinê biryara Dadgeha Dihokê ya ji bo rojnamevan û edîtorê beşa Erebî ya ajansa Rojnews’ê şermezar kir.

Der barê birîna cezayê 3 salan li rojnamevan û edîtorê beşa Erebî yê ajansa Rojnews’ê Silêman Ehmed Rêkxistina Casene ya Azadiya Raman û Çapemeniyê daxuyaniyek nivîskî weşand.

Daxuyanî wiha ye;

“Sepandina vî cezayî bi ser rojnamevan Silêman Ehmed li gor yasaya hejmar 21 ya sala 2003 ye ku yasayeke taybet e bi têkdana ewlekarî û îstiqrara Herêma Kurdistanê. Lê li gor vê yasayê eger vî rojnamevanî tawanek rojnamevaniyê kiriba jî diviyabû di çarçoveya yasaya hejmar 35 ya sala 2007’ê ya yasaya rojnamevaniyê hatiba dadgehkirin.

Rojnamevan Silêman Ehmed ji destpêka hatî girtin mafê wî yê hevdîtina bi parêzer û malbata xwe re tune bû heta qonaxa dema lêpirsînê. Ev jî binpêkirina eşkere ya mafê mirov, destûr û yasaya berkar a Iraqê ye.

Cezakirina rojnamevan Silêman Ehmed di demekê de ye ku berî niha çendîn rêxistinên navnetewî û herêmî rexne li rayedarên Hikûmeta Herêma Kurdistanê li ser mijara cezakirina rojnamevanên herêma Behdînanê û Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî soz dabû ku wê vê mijarê çareser bike. Lê belê rewş neguheriye û ji bilî ceza birîna li Silêman Ehmed, di van rojên dawî de gelek rojnamevanên ku ji bo şopandina êriş û dagirkeriya dewleta Tirk serdana Behdanînê kiribûn, hatin binçavkirin.



Em weke Rêxistina Casene ya Azadiya Raman û Çapemeniyê, cezayê nedadperwerane yê ji aliyê Dadgeha Duhokê ve li rojnamevan Silêman Ehmed hatiye birîn şermezar dikin ku bi hewldaneke berdewam ya ji bo tepeserkirina azadiya raman û çapemeniyê dibînin.”

Dadgeha Dihokê bi tometa endamtiya PYD’ê 3 sal cezayê girtîgehê li rojnamevan û edîtroê beşa Erebî ya Rojnews’ê Silêman Ehmed birî. Ev biryar bi lez û bez ji aliyê rêxistinên parastina mafên rojnamevanan hate redkirin û weke biryareke nehiqûqî bi nav kirin.

Navenda Metro ya ji bo parastina mafên rojnamevanan têkildarî cezayê ku dadgeha Dihokê li rojnamevan Silêman Ehmed birî got: “Biryara Dadgeha Dihokê ya li beramberî Silêman Ehmed ne dadperwerane ye. Ti mercekî dadgehkirinek dadperwer têde nebû. Em daxwaza betalkirina biryarê dikin.”

Di 29 Tîrmehê de dadgeha Dihokê rûniştina doza rojnamevan Silêman Ehmed pêk hat. Dadgehê bi tometa ku Silêman Ehmed ‘Endamê PYD’ê ye’ sê sal cezayê girtîgehê li rojnamevan Silêman birî. Têkildarî biryarê Navenda Metro daxuyaniyek parve kir. Di daxuyaniyê de tê diyarkirin ku ji roja Silêman Ehmed hatî girtin ve (23’yê Cotmeha 2023) wek Navenda Metro wan gelek daxuyanî û daxwaz pêşkêşî desthilata dadweriyê kirine.

Navenda Metro got: “Me daxwaz kir ku dosya dadgehkirinê li gor yasa hejmar 35 a sala 2007’an a yasaya rojnamevaniyê be. Me xwest ku rê bi malbat û parêzerên wê bê dayîn ku hevdîtinê li gel de bikin. Me xwest ku dadgehkirina Silêman Ehmed di hewayeke dadperwerane de pêk were.”

Di dewamê de tê gotin: “Biryara Dadgeha Dihokê ya li beramberî rojnamevan Silêman Ehmed ne dadperwerane ye û mercên dadgehkirinek dadperwerane tê de nebû. Daxwaza betalkirina biryarê dikin.”

Her wiha bang hate kirin ku dadgehê weke tolhilandina dijî rojnamevanan bikar neynin û tê gotin, pêwîst e di mijara azadiya çapemeniyê de şert û mercên darizandinek adil bên afirandin. Nabe di bin ti hêncetek din de yasayek din were bikaranîn û wiha tê gotin; “Piştî 211 rojan rê hat dayîn parêzer wî bibînin, ev hemû li ser rastiya tometên ku ji bo Silêman tên gotin, gumanan ava dike.”

Her wiha Federasyona RONÛS’ê biryara ceza birîna li rojnamevan Silêman Ehmedî bi tundî şermezar kir û got; “Siyasiyan di bin siya dadgehê de plan ji bo vê biryarê çêkirine û bang li hemû aliyan dikin ku kampanyek berfereh organîze bikin ji bo şopandina biryara Dadgeha Dihokê û her wiha ji bo ku rê neyê dayîn sîstema dadwerî ji bo daxwazên partiyan û ajandayên derve bên bikaranîn.”

Federasyona Rojnamevan û Nivîskarên Serbixwe (RONÛS) der barê 3 sal cezayê girtîgehê yê îro ji aliyê Dadgeha Dihokê ve li rojnamevan Silêman Ehmed hat birîn de daxuyaniyek weşand.

Di daxuyaniyê de hate gotin ku, ew wek Federasyona Rojnamevan û Nivîskarên Serbixwe (RONÛS) bi tundî biryara Dadgeha Dihokê ya ceza dayîna rojnamevan Silêman Ehmed bi tundî şermezar dikin ku di bin siya dadgehê û binavê dadgehê ji aliyê siyasiyan (hizbî) ve plan û bername jêre hatine çêkirin.

Di dewamê de bal kişand ser hincet û sûcdarkirinên bêbingeh û bê belge li dijî Silêman Ehmed û wiha hate gotin; “Li ser tohmetên ku tu delîlên îsbatkirinê nehatine pêşkêşkirin û ji raya giştî re nehatine eşkerekirin, ankû heman tawanên sîxuriyê û hewldana têkbirina ewlehiya Herêma Kurdistanê ye. Çend sal berî niha hejmarek rojnamevan û çalakvanên sivîl li herêma Behdînanê hatin cezakirin ku ev jî moreke din a şermê ye li nav çavê desthilatdarên siyasî yên Herêma Kurdistanê û sîstema dadweriya Herêmê.”

Federasyona RONÛS bang li hemû rêxistin, sendîka, navend û platformên parastina mafên mirovan û azadiya ramanê, hemû azadîxwaz, welatparêz, rojnamevan, nivîskar û aktîvîstên civaka sivîl kir ku ji bo şopandina biryara Dadgeha Dihokê ya li dijî rojnamevan Silêman Ehmed kampanyayeke berfireh lidar bixin, ji bo ku rê neye dayîn sîstema dadwerî ji bo daxwazên partiyan û ajandayên derve bên bikaranîn.”

Her wiha federasyonê bang li balyozxane û konsulxaneyên welatên li Iraq û Herêma Kurdistanê jî kir ku hewlên xwe bidin ji bo şopandin û betalkirina biryara Dadgeha Dihokê. Di dawiya daxuyaniya Federasyona RONÛS’ê de wiha hate gotin; “Azadî ji bo rojnamevan Silêman Ehmed û hemû azadîxwazan. Her wiha berdewamî ji têkoşîna sivîl, azadiya çapemenî û nivîsandinê.”

# ‘Vegera gelê Şengalê siyaseta PDK’ê û dewleta Tirk vala derxist’

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Hevserokê Desteya Rêveber ya Rêveberiya Xweser a Şengalê Xwedêda Ilyas diyar kir ku gelê Şengalê gav bi gav vedigere ser ax û milkê xwe û siyaseta şerê Taybet ya ku ji aliyê PDK û dagirkeriya Tirk li dijî civaka Êzidî tê meşandin, bê encam dimîne.**

Di 3 Tebaxa 2014`an de çeteyên DAIŞ`ê êrişî herêma Şengalê ya Başûrê Kurdistanê kirin. Piştî êrişê pêşmergeyên PDK`ê çeperên xwe berdan û rê li pêşiya DAIŞ`ê vekirin ku derbasî Şengalê bibin û dagir bikin. Di encamê de komkujî pêk hat û bi hezaran Êzîdî hatin kuştin û nêzî 5 hezar jin û zarok hatin revandin, di heman demê de welatiyên ku bi maşîneyan û yên ku bi meşê jî derketin berê xwe dane çiyayên Şengalê. Piştî rizgarkirina Şingalê ji aliyê YPŞ û YJŞ’ê ve, roj bi roj gelê Şengalê vedgere ser axa xwe. Li gorî agahiyan rojane ji 100 heta 150 malbatî rojane vedigerin Şengalê.

Di vê çarçoveyê de hevserokê Desteya Rêveber ya Şengalê Xwedêda Ilyas ji Rojnemeya me re axivî.

Xwedêda Ilyas di destpêka axaftina xwe de wiha got: “ Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên DAIŞ`ê hewl dan ku civaka Êzidî di komkujiyan re de derbas bikin û wê qir bikin. Ev ferman di rastiya xwe de tinekirna gelê kurd û bi taybetî kesên dildarê demokrasiyê bû. Di heman demê de jî dijmin heya niha xwedî hewldane ku careke din civaka me ya Êzidî di nfermaneke nû re derbas bike, ji ber tê dîtin ku gelê me yê Şengalê hem bûye xwedî stato hem jî bûye xwedî xweserî, ji ber vê jî dijmin tengezar bûye. Di heman wextî de PDK’ya ku bû sedema vê fermanê, îro jî bi alîkariya dagirkeriya Tirk şerê taybet ji her demî zêdetir li dijî civaka Êzidî dike. Dema ku em li dîroka mirovahiyê bi rengekî rast temaşe dikin, em dibînin ku 2 çem bi hev re diherikin; yek ji wan li ser xeta qehremantiyê diherike, yê di jî li ser xeta xiyanetê diherike. Ji xwe xeta xiyanetê malbata Berzanî ye û xeta qehremantiyê jî têkoşerên ku ji bo xaka Şengalê canê xwe feda dikin.”

**‘Sedema sereke ya komkujiyê xiyaneta malbata Berzanî bû’**


Xwedêda di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Di 3 Tebaxa 2014`an de Malbata Berzanî îxanet li gelê Şengal kir û di dawî de jî wekî ku ev îxanet normale be hesiband. Malbata Berzanî nikare ku gel biparêze, gelek soz dan gotin; em ê Şengal biparêzin û berdan. Wekî dawiya Sedam Husên hat, wê dawiya Berzanî û Erdogan jî bê. Em di dîrokê de dibînin ku Berzaniyê mezin digot eger win dewlet dixwazin Tirkan ji bona xwe wekî sîber bibîn in, yanî hêviya avabûna dewleta Kurd bi destekdayina dewleta Tirk ve didît. Mixabin îxaneta Mala Berzanî bû sedem ku 7 hezar mirov di qirkirinê re derbas bibin û heya roja niha 2700 mirov jî bi ti awayî agahî ji wan nayê girtin. Niha Malbata Berzanî ji ber ku şerekî gelek taybet dide meşandin, Êzidiyên ku li dervî Şengalê ne jî nikarin vegerin, ji ber tirsek gelek dijwar di dilê wan de ragirtiye.”

**‘Dixwazin careke din fermana 2014`an li ser civaka Êzidî dûbare bikin’**

Ilyas wiha li axaftina xwe zêde kir: “Pêwîst e ku gelê me di vê mijarê de bîrewer û xwedî zaniyarî be. Em wekî Rêvberiya Xweser dema ku em dibînin rêjeyek ji gelê me vedigere herêmê kêfxweş dibin, bi dilekî gerim wan pêşwazî dikin, ji ber ku ev gel gelê me ye û em mecbûrin ku xwedî li wan derkevin, herwiha em bibin mal ji koçberên xwe re. Di heman wextî de rêjeyek ji gelê me yên Êzidî koçî welatê derve bûn û heya niha dewama jiyana xwe li welatên xerîbiyê dikin. Niha alîkariya ku Netewên Yekbûyî ji bo gelê me yê Şengalê re dike, ji nîvî zêdetir rayedarên Başûrê Kurdistanê ji bo berjewendiyên xwe bi kar tînin. Dewleta Îraqê jî di vî derbarê de gelek kêmaniyên wê hene, heya niha Jinosayîta qebûl nekirye û wekî komkujî nahesbîne, ji bo vê yekê pêwîst e hisab ji berpirsê sereke yê fermanê were xwestin. Îro jî dixwazin careke din fermana 2014`an li ser serê gelê me yê ÊzIdî dûbare bikin.”

**‘Saziyên ku qaşo mirovî ne li dijî mirovahiyê ne’**

Hevserokê Desteya Rêveber ya Rêveberiya Xweser a Şengalê Xwedêda Ilyas di dawiya axaftina xwe de balkişand ser nedestekdayina dewletan ji gelê Şengalê re û wiha got: “Heya niha dewletên derve ji bona gelê me yên şengalê ti gav navêtine û her dem bêdengî esas digirin. Kesên ku dibêjin em mafê mirovan diparêzin ji bona Şengal tiştek nekirin e, wê demê navê wê ne mafê Mirovane. Bi tenê saziya UN di vî mijarî de bûye destek wekî din heya niha kesekî alîkariya xwe ya ji bo Şengalê raneghandiye. Ev jî bi serê xwe pirsan di hişmendiya mirovan de dide avakirin, yanî saziyake ewqas bi hêz çawe nikare ji bona gelê me bibe destek, herî kêm dikare dewleta Îraqê hişiyar bike ji bo ku jinosaytê qebûl bike, wê demê saziya li dijî mirovahiyê ye. Bêguman di sala 2018`an de nêzî 120 hezar mirov li welatên derve jiyana xwe derbas dikirin. Her wiha bi awayeke rojane 100 heya 150 mal vedigere axa xwe. Gav bi gav gelê me yê Êzîdî vedigere û siyaseta şerê Taybet ya mala Berzanî û dewleta Tirk vale derdixe.”



# Zekaya çêkirî

Navenda Nûçeyan

Hişê çêkirî, zekaya sinaî yan jî zekaya çêkirî...

Wekî ji serenavê jî tê naskirin, ev, zêdetir ji ziman meqelayeke li ser pêşketinên zanistî yanî li ser 'hişê çêkirî' ye. Lê pirsgirêka me heya ku ew jî ne ji rêzê ye; pirsgirêkeke dîrokî-civakî ye. Yanî me serenavê nivîsê danî lê her kes, herî kêm ên ku vê bixwînin dê heman tiştî nas bikin yan na şik û gumana me heye. Ji ber wê yekê ji beriya em bikevin nava mijarê me xwest li ser wateya kelîmeyan li hev bikin. Li gorî fîlologan (zimanzan) jî maneya herî teng a ziman ev e: 'wekî ku ji heman wateyê derxînin dengên ku li ser li hev kirî'. Me ji ber vê yekê hevoka destpêkê ya nivîsê danî ku mijara me li ser çi ye, zûtir were naskirin.

Ev mijar di van salên dawî de rojeva mirovahiyê mijûl dike. Eger tu bidî li pey medyaya dijîtal, aliyê wê yê xeter jî derdikeve pêş; li gorî xwe aliyê baş jî derdixin pêş. Di vê derê de ev yek derdikeve holê. Dema ku mirov lêkolîneke herî biçûk jî dimeşîne derdikeve holê ku aliyê xeter ê zekaya çêkirî derdixin li pêş ew in ku hê ji taybetmendiya civakê ya jê re exlaq tê gotin dest bernedane. Yanî li pêşberê têgîna civakbûnê, yekparetiya heqîqeta civakî hestiyar û di astekê de xwediyê hişyariyê ne.

Feraseta pergala heyî ya cîhanî ji bo zekaya çêkirî çawa difikire, çi lêkolîn dike, niha gihaştiye kîjan astê helbet girîng e. Çima? Wê demê em ê zanibin ku ji eniyeke din ve civak-mirovahî bi xetereyeke çendî mezin re rû bi rû ye. Lê hûrguliyên wê pir ji me re ne girîng in. Mînak, ev lêkolînên wan, ev meraqa wan di kîjan qonaxan re derbas bûye, xwe gihandiye ku derê; ji me re pir ne girîng e. Ji ber ku feraseta hêzên hegemon ê cîhanê, patronên medyaya dijîtal ( Elon Mousk û hwd) ya zekaya çêkirî, "pêwîst nake her kes bifikire em ê li şûna we bifikirin. Ev, feraseta naskirî ya dijberê civakê bi xwe ye. Mînak pergala cîhanî ya dewletdar dibêje; "pêwîst nake civak xwe biparêze, ji ber ku ez ê artêşê ava bikim û wê biparêzim." Bi rastî jî di encamê de bi hezar curî artêş hatine avakirin. Lê ew dihizirin ku bi wî rengî wê bikaribin civakê biparêzin; lê bi vê yekê xwe ji civakê diparêze. Dîsa nahêle her netew, her çîn ji xwe re pergala perwerdeyê ava bike. Dibêje "ez ê pergala perwerdeyê ji civakê re çêbikim". Çêdike. Di encamê de dewletek ji her aliyî ve bi endamên ji vê derê derketine xwe xwedî dike. Aboriya civakê ne civak, sermayedar bi rêve dibin. Civak dixebite û sermayedar dewlementir dibe, civak her û her xizan û birçî ye. Huner... wêje... ... tev di vê rewşê de ne.. ''Ma çi pêwîst dike ku her kes bi hunerê re, bi wêjeyê re mijûl be'. Li ser vê ferasetê niha cîneke hunermend û wêjevanên ji civakê cuda çêbûne. Civak ji hev hatiye qutkirin, jêr û jor, çîn û hişmendiya desthilat ji roja destpêkê ve wisa çêbûne.

Herî dawî jî pergala kapîtalîstdagirker xwe gihandiye vê ferasetê:

"Hewce nake mirov bihizrin, makîneyan em ê çêbikin dê li şûna mirov bihizrin.feraset ev e. Ya din jî mirov, civak bi fikirînê bûye mirov, bûye civak. Eger mirov-civak vî mafê xwe bide hêzeke cuda tê wateya ku ji mirovbûna xwe dûr dikeve.

Bi rastî ev mijar têra xwe tevlîhev û bi mijarên cuda ve girêdaye. Ji ber ku ne gengaze di vê nivîsê de vî aliyî jî destnîşan bike, em ê di beşa duyemîn ê nivîsê de li ser bisekinin..

Reman-zeka bi her zindîyî re heye; bi her hebûnê re heye. Li gorî Tao, ku oleke Asyayî ye, 'heqîqeta fikir-zekayê di keviran de razayî ye, di nebatan de xewin dibîne, di ajalan de şiyar dibe û di mirov de jî pê dizane ku şiyar bûye'.

Kengî ku mirov dest li kevirikî, darekî kir ku xwe biparêze; nêçîra xwe bike, wê demê mirov dest bi mirovbûn û civakbûnê kiriye. Yanî di wê mebestê de mirov hiziriye û ketiye li ser mirovbûnê. Zanist jî ji bo heqîqeta fikirînê tenê ji bo mirov û pêşketina civakî tehlîleke wisa dide pêş.

Ne tenê olên Asyayî û zanist derbarê fikir û aqil de bi nêrînên xwe rêya me ronî dikin: Di Îslamiyetê de Xweda aqil dide mirov û mirov dike hebûnek xwedî şeref ê gerdûnê.

Em bi vê mîrateya bê hempa ya kevneşopiya dîrokî ya civaka mirov, dizanin ku zeka-fikir mirov-civakê ji hemû hebûnên din cuda dike. Dibe ku însan dernexîne derveyê xweza û gerdûnê, lê rewşa wî cudatir dike.



Mirov-civak piştî ku ji rêya civaka xwezayî derket, çîn-desthildatî dewlet ava kir, ji vê pê de aqil-zekaya xwe jî xist xizmeta qewmê xwe, çînê xwe, dewleta xwe. Heta zanist ji binî de xizte bin xizmeta xwe. Fikir-zanistê di destpêkê de kevir, dar an jî tiştekî din ji bo ku mirov bibe mirov, civak bibe civak da destê mirov: Angu mirov fikirî kevirek, darek ji bo xwe û civaka xwe bi kar anî. Lê dema ku deriz li fikr û aqlê mirov ket, du bendî û ji rêderketin çêbû, aqil û zekaya mirov dewletên ji dewletan şidayîtir zalimtir, kedxwartir bi pêş xistin.

Ji ber ku zanist jî êdî di xizmeta hêzên desthilatperest de ye dikare îro behsa 'zekaya çêkirî' bikin. Çarçoveya 'zekaya çêkirî' ku ew behs dike, înternêt, tlf bi-aqil, erebeyên bi aqil, û hwd ye. Bi vê rewşa xwe zekaya çêkirî, wekî amûreke notr ku zerara wê nebe xuya dike. Lê her tişt ne ewqas hêsan e. Bi vî halê xwe jî mînak, înternêtek, telefonek li ser civakbûnê çendî bandoreke ne baş dike tam ne diyar e. Eger bi şiklê ku ev bandor ji holê werin rakirin, mirov wisa bifikire, ne înternêt, ne telefonên bi aqil bi zerer in û hwd, hemû jî amûrek in û dişibin çekekê. Mînaka herî balkêş çek e. Çekek dikare ji bo armanceke xirab jî were bikaranîn. Lê di destê şervaneke/î gel de berxwedana li dijî diminên dagirker de hebûneke bê hempa ye.

Dîsa, eger em li ser mînakan biçin; tv, medya û çapemeniya dîjîtal a bi her awayî amûrên dest jê nabe yên hêzên şoreşger in jî. Di vê derbarê de ya girîng ew e ku mirov bi çi hişmendiyê nêzîkî van amûran dibe; van, ji bo kîjan armancê bi kar tîne.

Ruxmî ku di vê astê de wekî hinekê safî be diyar dike jî di hûrguliyên xwe de mijar dîsa xwe digihîne asteke têvlîhev. Bernameyên wergerê yên di Googil de, bernameyên ku nivîsekê tercume dikin û bi dengê kesa/ê tê xwestin dixwînin pir balkêş in. Pêwîst e ev neyê wateya ku em li dijî pêşketinên zanistî ne. Çawa? Mînak, Googil yan jî bernameyekê di nîvenga înternêtê de nivîsekê werdigerîne, bi dengê kesekî nivîsê dixwîne: Ya yekemîn dema ku mexzena wergerê ya Googilê tê dagirtin her hal bi hişmendiya azadixwaziya civakê yanî bi hişmendiya Şaristaniya Demokratîk nayê dagirtin. Em wekî dilxwazên vê paradîgmayê çawa li ser hemû silsileya vê hakim bin. Jixwe heta ku em yek bi yek peyvan û hevokan re mijûl bin em ê bi zekaya xwezayî werger bikin. Yanî heta ku ev qada di serweriya vê hişmendî û zehniyeta dij civakî de be ev qad ne bi ewle ye. Ya duyemîn, bernameyên dengê kesekî digirin û wekî ku ew kes bixwîne kar dikin, teqlîda kesekî bi rastiya wî/ê re dixin nava hev û ji şêlûbûnê re rê vedikin. Ya din; wekî kesên duyemîn em ê çawa li ser vê kontirola xwe çêbikin? Ji ber vê yekê mijar dikeve warê exlaqî jî yanî sibe du sibe gotin û axavftinek ku kesekî nekiriye dikare li ser were îdîakirin.

Dikare bi hezaran mînakên wisa were zêdekirin. Dibe ku hin teknîkan pêşketina xwe temam nekiribe, niha bi aliyê xwe yê negatîf xwe bidin pêş. Ji ber wê yekê zêde kûrkirina mijarê zêde nedicih de be jî. Yanî şaş derkevin. Lê mînakeke di vî warî de dide dest ku çiqes em mafdar in: Bernameyek heye wêneyan paqij dike, safîtir dike. Rewş ev e. Mînak, resmekî di sed sala 20. Di civaka Rojhilata Navîn de hatiye kişandin, dema dikeve vê bernameyê tu dibêjî qey te îro daye kişandin. Mînak, resmê şoreşgerên salên 70-80'an wekî ciwanekî/e îro dîzayn dike. Werhasil...

Bêyî ku em zêde dirêj bikin em dikarin wisa bêjin, ji aliyê karê rojane ve mirov zêde îtibarê bi van bernameyên qaşo 'zekaya çêkirî' neke baştir e. Ji ber ku medyaya dîjîtal, ji bazar û feydeya xwe kar dike. Gotina dawî karibe were gotin ev e; hişmendiyek ku zekaya xwezayî dikuje ti car 'zekayeke çêkirî' naxe xizmeta mirovahiyê: Eger kiriba çima ya hazar bikuje? Li cîhanek ku di du-sê mehan de zêdetirî 30 hezarî Filîstînî tê kuştin, tenê ji ber ku kerba jê rake tang didin li ser zarokên Kurdan bi vê bawer kirin ji zehmet bûnê wêdetir ne gengaz e.



# Azadiya Rêber Apo çareseriya aloziya Rojhilata Navîn e

**Endamê Yekîtiya Rewşenbîrên Kantona Cizîrê Beşîr Mele Newaf diyar kir ku azadiya Rêber Apo û çareserkirina doza kurd riya çareseriya aloziya di hundirê Tirkiyê û Rojhilata Navîn de ye.**

Navenda Nûçeyan

Zêdeyî 25 sal in Rêber Abdullah Ocalan li Girtîgeha Girava Îmraliyê di bin şert û mercên tecrîda giran de tê ragirtin û 40 meh in ti agahî jê nayê wergirtin. Mafê hevdîtina bi malpar û parêzeran re bi temamî jê hatiye standin. Dewleta Tirk bi vê tecrîda li Îmraliyê re hem hiqûqa xwe ya hundirîn hem jî peymanên navneteweyî yên mîna Peymana Mafên Mirovan a Ewropa û Peymana Neteweyên Yekbûyî yên Têkildarî Pêşîgirtina li Êşkenceyê, binpê dike. Ku dewleta Tirk bi xwe jî ev peyman îmze kirine. Dewleta Tirk ji bo ku li qada navneteweyî vê bêhiqûqiya xwe veşêre, hincetên mîna cezayên disîplînê û qedexeya hevdîtina bi parêzeran re, nîşan dide.

Li hemberî vê bihiqûqiyê jî CPT bêdengiya xwe didomîne. Parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û ji qadên navneteweyî gelek rêxistin, sazî û kesayetên cuda têkildarî tecrîda Îmraliyê serî li CPT'ê dane, lê CPT'ê yan serlêdan bêbersiv hiştine yan jî bi gotina 'em mijarê ji nêz ve dişopînin' ji bersivê reviyaye. CPT li hemberî vê rejîma tecrîdê heta niha ti daxuyanî nedaye û bi vî rengî nîşan dide ku ew jî hevkarê sûc e.


Derbarê tecrîda ku li ser Rêber Apo tê meşandin, endamê Yekîtiya Rewşenbîrên Kantona Cizîrê Beşîr Mele Newaf ji Rojnemeya me re axivî. Beşîr Mela Newaf diyar kir ku pêngava azadiya Rêber Apo li ser asta cîhanî deng veda û wiha got: "Bêguman pêngavekî wiha li ser asta Kurdistanê û Navnetewî, mirov dikare bibêje ku çalakiyeke demokiratîke û ji bo ronîkirin û pêhesîna raya giştî re ye, di derbarê pirsa kurdî û di heman demê de rewşa Rêber Apo, ji aliyeke din jî wekî teşhîrkirina dewleta Tirk a dagirker e ku xwe di hesbîne rêjîmeke demokiratîk de dihesibîne. Di encama van çalakiyan di rapora CPT de mirov dikare ji nêz ve bixwîne, ew rapora ku beriya çend rojan derket, li hemberî ewqas çalakî, pêşedan û meşên ku li ser asta cîhanî rû dane, rapor ne ji dûr û ne ji nêz ve neket qala mafê mirovekî sirûştiyê ku mafê wê di tevahiya qanûnê cihanê de heye, lê ti maf tune ye ku wî ji parêzer û malbat qut bike, di heman demê de her kesên pêwîndîdar jî xwe bê deng dikin li hemberî van sûcên dewleta Tirk yên dijmirovî. Ji ber vê yekê pêwîste her kes rewşa Rêber Abdeullah Ocalan bipirse û bi wijdanî nêzî bibin û pêwîste li ser rewşa kurdan jî were pirsîn."

**'Tirsa Dewleta Tirk a dagirker ji ramanê Rêber Apo ye'**

Beşîr da zanîn ku dewleta Tirk a dagirker werîsê dewleta osmaniye û wiha got: "Di derbarê pilan û qirkirinê de û çewsandina gel de, xwedan ezmûneyeke bê hempa ye. Her wiha di vê derbarê de feylesûfekî Misirê bi navê Murad Wehbê dibêje;Tevahiya nêrîn û rêxistinên faşîst, di heman demê de komikên terorê yên di Rojhilata Navên de wekî werîsê dewleta Osmanî ne, ji xwe werîsên dewleta osmanî, dewleta Tirke. Em dibînin ku destê dewleta tirk a dagirker di her derê ye, bi taybet ji aliyên pirsgirêkên heyî ji Ewropa, Efrîqiya û Asiya yê, li van dewletan jî dewleta tirk a dagirker destê xwe xistiyê de. Rêber Abdullah Ocalan ji her kesî zêdetir rewşa kurdan dinase, bi taybet di ronîkirin û arîşeyên vekirina pirsên heyî. Ji ber vê yekê dema ku arîşeyên yan piegirêkên li ser asta Kurdistanê çêdibûn û derveyê wê dide lê pirsîn û lîkolîn kirin, ji ber wê dewlata Tirk a dagirker her ku diçe tecrîd li ser Rêber Apo zêdetir û girantir dike. Tirsa dewleta Tirk a dagirker ew e ku fikir û felsefeya Rêber Apo çareseriya pirsgirêka Rojhilata Navîn bîne, her ku diçe di bin nave cezayê dispilînî tecrîd dirêj û giran dike."

**'Bêdengiya CPT tê wateya hevkariyê'**

Beşîr Mele Newaf di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Pêngava Azadiya Rêber Apo a fîzîkî di asta cîhanî de wate û girîngiyekî xwe yê taybet heye. Ji xwe di derbarê ronîkirina pirsa Kurdî û têkildarî rewşa Rêber Apo gelek xebatên çihreng hatine meşandin. Bêguman encamên van çalakî û xwepêşandan de mirov dikare bi vî rengî diyar bike ku CPT di meseleya gelê Kurd û bi taybetî ji bo Rêber Apo hevkarê dewleta Tirk a dagirker e. Aloziya di hundirê Tirk de çareser bibe, pêwîste di serî de hem Rêber Apo azadiya wî a fîzîkî pêk were û hem jî pirsgirîka Kurd were çareserkirin, bi vî awayî pêkane ku ev gengeşî werin bi dawî kirin."



**'Pêwîst e civak xwe ji aliyê Rêxistinî û siyasetê ve kûr bike'**

Endamê Yekîtiya Rewşenbîrê Kantona Cizîrê Beşîr Mele Newaf di dawiha axaftina xwe de wiha got: "Avabûna civakê bi hîmê axlaqî ve girêdayî ye. Civaka kurdistanî ji bo ku nirxên xwe biparêze her demî li ber xwe daye û xeta qehermaniyê ji xwe re bingeh girtiye, yanî civak berdevkê xwe ye. Ev tekoşîn û têgihştin jî bi damezrîneriya Fikira Rêber Apo ye ku stato da gelê Kurd. Ji lewra pêwîst e civak xwe di hêla Rêxistinî û siyasetê de kûr bike, di heman demê de tekoşîna xwe bi leztir bike. Di heman wextî de jî barê ku nivîskar jî bavêjin ser milê girane, pêwîst e kesên ku pênûsa wan xort be bikaribin hîtabeta şoreş û civakê bikin."

# Berpirsiyarê Fermana 74. kî ye?

Volqan Elî

Çeteyên radîkal Îslamî-cîhadîst ku xwe wekî DAIŞ îlan kiribûn, piştî ku Mûsil bajarê herî mezin ê Iraqê xistibûn destê xwe, bi lezeke mezin bi pêşketin. Dema Telafer jî ket dor hatibû Şengalê. Ewrên reş kom bibûn; hemû amadekariyên fermanê ji berê de hatibûn plankirin û ji bo ku di her kêliyê de bikeve nava liv û tevgerê xwe mifte kiribû. Êdî xewnereşkek ji şevên tarî jî tarîtir xwe berdabû li ser Şengalê. Careke din biryara fermanê hatibû dayin. Wê li ser fermanên Êzîdiyan ku hatine jiyîn yeke din bihata zêdekirin. Êrîşa herî hovane ku sedsala 21. dîtiye, ew ê vê carê bi destê çeteyên DAIŞ'ê bihata kirin. Fermana 74. a li ser Êzîdiyan bi hovitiyeke ewqas mezin hate kirin, ruxmî ku ewqas sal di ser re bihorîne, çarçoveya vê karesatê hê jî zelal nebûye. Êzîdîtî, têrê kiriye ku însan were kuştin. Ev civata herî bê parastin û bê guneh ku dibêje "ji beriya me, ji bo 72 qewman û paşê ji bo me", berê 73. Ferman dîtibû. Fermana dawî jî, bû fermana herî bê rehm a dîroka Êzîdiyan. Bi fermana 74. Şengal bi erdê re bû yek û Êzîdiyan trajediyeke mezin a mirovahiyê derbas kirin.

Dema ku di 3'ê Tebaxa 2014'an de kuştina mirovan dest pê kir, gel ne amade bû. Bi encameke pir giran Şengal bibû deryaya xwînê. Şengala ku gelek ziman, çand û baweriyan bi hev re lê dijiya, êdî ne Şengala berê bû. Şengala ku Kurdên Sunî, Ereb, Tirkmen, Aşûriyên Xiristiyan û kêmekê jî Ermen û Êzîdî tev bi hev re lê dijiyan, êdî tenê bi rengekî, bi rengê reş xwe nuxumandibû. Ji derveyê kesên ku hevkarên DAIŞ'ê ne, ji her beşên civakî ku li Şengalê dijiya, bi rengekî ji vê fermanê bandor bû. Lê karesata herî mezin Êzîdiyan dît. Di encamê de bi dehan gorên komî, bi hezaran kuştî, bi hezaran jinên kole, bi penaberiya ji nîv milyonê zêdetir, bi gundên vêran kirî karesateke pir mezin derket holê.

Gelek sedema jenosîda bi fermana 74. derketiye meydanê hebû jî, di rastiya xwe de tenê yek sedema wê hebû; ew jî Êzîdîtî bû! Tenê yek berpirsiyarê wê hebû, ew jî PDK bû! Bêyî ku ev rastî were dîtin, kirina nirxandinên bi tendirustî zêde ne mimkun e. Heta hewldaneke bi vî şiklî tê maneya berevajîkirina heqîqetê. Ji beriya ku bikeve, Şengal ji aliyê KDP'ê ve dihate îdarekirin. KDP'ê, Şengal bê parastin hiştiye û dest jê berdaye. Ev, ji beriya her tiştî, tercîheke bi zanebûn e. Dema gel xwestiye ji ber ewlehiyê ji Şengalê derkeve, dîsa ji aliyê KDP'ê ve hatiye astengkirin. Ev jî biryareke polîtîk e. KDP'ê, Êzîdî bi çarnûsa wan re rû bi rû hiştiye, bi zanebûn, bi dil ji însaf û rehma (!) DAIŞ'ê re hiştiye. Ji ber vê yekê encama vê nijadkujiyê girantir bûye. Ji bo destpêkê di cih de ye ku mirov hinekê Şengalê bide nasîn. Ji beriya vê fermanê, bi tena serê xwe PDK'ê li Şengalê bibû îktidar. Helbet partiyên din ên li Başurê Kurdistanê xwediyê rêxistin in, li vê derê jî xwe bi rêxistibûn. Lê belê di rewşeke pir zeyif de bûn. Her çendî tesîreke wan a pir cidî tinebû jî, di maneya siyasî de li pêşberê girseya ku bi wan ve girêdayî berpirsiyar in. Dîsa rewşa partiyên Êzîdî jî dişibe vê rewşê. Teqedum û partiyên din nekarîne analîzeke baş bikin, nekarîne li beramberê fermanê seknekê nîşan bidin, li pêşberê pêşketinan eleqadarî û berpirsiyariyê raber bikin.

Sedemeke girîng a din jî rewşa navneteweyî ye. Di qetlîama li ser Êzidiyan de her çiqas rola kirêt DAIŞ û PDK'ê pê rabûyîbe jî, sekna navneteweyî ya hê rastir sekna navdewletî jî ji vê berpirsiyar e. Çima? Em bêjin malbata Barzanî Êzidî kirin qurbanê peymana di navbera xwe û DAIŞ'ê de. Ruxmî li Şengalê desthilatdarî di destê wê de bû, Êzîdî neparastin û tew çek û cebilxaneya xwe jî bi xwe re revandin. Li aliyê din dewletên herêmê, dewletên li cîhanê hakim ji vê re zemîn xweş kirin. Mînak, PDK wekî hêza fermî ya ku temsîla Êzidiyan dike, nas kiribûn. Wekî hêzên serdest, wekî dewletên xwediyê dîplomasî û siyaset têkiliyên bi PDK'ê re esas digirtin. Lê belê piştî fermanê derket holê ku PDK'ê bi DAIŞ'ê re peyman çêkiriye û li gorî vê xwe paşde kişandiye. Dema ku ev eşkere bû, tiştekî ku ev hêzên qaşo pir ji gelê Êzidî hez dikin bibêje, nema. Dibe ku gelek şîrove kiribin, nifirên xwe li ser DAIŞ'ê barandibin; lê di mijara rola xirab a PDK're kor û lal bûn. Ji ber ku hê di vê mijarê de kor û kerr in, dawetiye ji feramanên nû re derdixin. Tenê hêza ku wan biparêze, Êzîdiyên ku li derdora parastina cewherî xwe bi rêxistin kirine.

## Hewldanên tunekirina PKK'ê



Farûk Sakik

Em di tiştek de li hev bikin. Dijminê Kurdan kî ye? Peyva faşîzma AKP-MHP'ê em bi kar neynîn. Dewleta Tirk a dagirker 'dijminê gelê Kurd e'. Ev dijminatî sed sal berê ji bapîrên xwe girtine û hetanî roja me anîne.

Navê partî û rêvebiran tê guhertin, lê ev pîlana wan a qirkirina Kurdan hîç nayê guhertin. Hêzên ku bûn desthilatdar, di destpêkê de, li ser diminatiya Kurdan sond dixwin.

Hevserokê Konseya Rêveber a KCK'ê Cemîl Bayik di Stêrk TV de digot: Qanûnek dewleta Tirk heye. "Li dijî Kurdan çi were kirin, mafdar e." Belê îroj vî mafê xwe bi her awayî bi kar tîne. Herî dawî qedexekirina govend û stranên Kurdî parçeyek vê qanûnê ne. Baş e çima êriş dike? Di van 40 salên dawî de PKK'ê çi bi destxistî dixwaze ji holê rake. PKK li herêmên di bin dagirkeriya dewleta Tirk de ne asîmîlasyon bi dawî kir. Kurd bûn xwedî nasnameya xwe. PKK li Rojavayê Kurdistanê şoreşek û statuyek ava kir. Îroj êrişî vê statuyê dike. Herêm hatin dagirkirin û çete û malbatên wan li van deveran hatin bicîhkirin.

Ji cîhanê re got; ez pirsa koçberan çareser dikim. Aha îroj jî lihevkirina bi Beşar Esad re dixwaze hin herêmên din jî dagir bike û penaberên li axa xwe û çeteyên belav bûne bîne li vê derê bi cîh bike. Bi vê yekê re dixwaze peyamek bide dewletên Ewrûpa û dibêjin; "Aha va em pêşî li pêlên koçber-penaberan digirin da ku neyên welatê we." Bi kurtasî, tişta ku nikarê îroj bi serê xwe bike, dixwaze bi rejîma Şamê re pêk bîne. An jî çima Erdogan bi du Beşar bikeve û lava bike? Ji bo tunekirina Kurdan rûmeta xwe kir pênc pere. Îroj herkes pê henekan dikin û wan gotinên ji bo Beşar gotibû bi bîr dixin. Lê ne xema wî ye. Ew ji bo 'Kurd dayika xwe nebînin' her tiştên xwe bi hêsanî difiroşe.

Li herêma di bin dagirkeriya Iraqê de ye jî heman siyaset tê meşandin. Piştî ku li herêma Kurdistanê azad bû, dewleta Tirk bi du vê parçeyê azad ket, da ku ji holê rake.

Li her deverî bicîh bûn. Bê sînor baregehên xwe bi îstîxbarata xwe hatin vê herêmê.

Li aliyek jî bi çanda xwe, bi mitaehîtên xwe, bi dibistanên xwe ber bi vê herêmê birêketin. Îroj li kolanan muzîka wan lê dide, di TV'yan de rêzefîlmên wan hene, li bazarê markayên wan li ser dezgahan e. Lê dema li van 3 aliyên Kurdistanê ji bo paqijkirina destkeftiyên Kurdan, dijmin hewl didan, bi navê PKK'ê tevgera Kurdan li pêşiya wan asteng bû. PKK ji bo parastina destkeftiyan têkoşîneke bêhempa dida. Îroj bi tenê ev tevger di hedefa wan de ye.

Di warê leşkerî de dema ku xwest encam bigire rastî lehengiya Gerîlayên Azadiya Kurdistanê hatin. Bi ser neketin. Li rê û rêbazeke nû geriyan. Çawa di dîrokê de dijmin û dagirkerên Kurdistan hatibûn cem hev bi navê Sadabat û Cento hin peyman îmze kiribûn, îro jî dixwaze bi dewleta Iraq, Îran û Sûrî re heman peymanan çêke. Hevkarek din jî li vê 'koma dijminên Kurdan' zêdekirin. Malbata Barzaniyan.

Malbata ku di nav civaka Kurdan de îtibara xwe nemaye û desthilata wan a berê ji dest wan çûye, xwe spartin dewleta Tirk. Li hember gerîlayên Kurdistan li kêleka artêşa Tirk cîh girtin. Dema dewleta Tirk hat herêma Behdînan pêşî li wan vekirin da bi hêsanî herêmê dagir bikin.

Divê civaka Kurdan vê malbatê baş nas bike û helwest bigire. Da ku gerîlayên Kurdistan bikaribin Kurdistanê biparêzin.